

Reyîsî ji bo 4 salan ya-saya paraştina dîplomatan lixwe digire

»»» R:7



Xebata rizgarîder, xwe organîzekirin û damezrandina yek “hêza” pêşmerge

»»» R:3



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

91emîn salroja şehîdkirina rêber û bavê nasyonalîzma Kurdî

»»» R:4



Siyaseta Biden û bazarên Turmp

»»» R:8



Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (400) 06-21-2021 Buha (1000) Tûmen

Hemase û şanaziyekek din

Roja Înê 28`ê Cozerdanê binav hilbijartinê Serkomarî û Şewreya gund û bajar li Îrana di bin deştilata Komara Îslamî de bi rê ve çû;

Di vê piroseyê de ku wek dijberên rejîmê jê re dibêjin şanogerî, helbet ne ji rûyê dijaretîyeke heştî ve, belkî ji rûyê ezmûnên siyasî û nasîyariyeke dirus ji cewher û felsefeya rejîmê, car din gelên Îranê û ji hemûyan sertir gelê serbilind ê Kurd, hemaseyek afirandin ku di dîrokê de wek şanaziyeke mezin û îrade û hizreke siyasî tê tomarkirin. Ger fêl û lêbên rejîmê derkevtin, lê digel vê yekê jî ku rejîmê dawiyê penaha xwe ber bi sextekariyên êşkere ve bir, raya giştî bi başî agehdar e ku çi hemaseyek di Îranê de hatiye afirandin û bi alxahîni ve ti kes û aliyek nikare vê rastîyê vebîşêrin ku di 28`ê Cozerdanê de civatgeha Îranê bi tev pêkhatiyên xwe ve di bereya dij bi deştilatê ve xwe nîşan dan!

Eva ku dûr ji çavni-hêriyê nebû, hewildana rejîmê bo sextekarî ji piroseyeke nerohn bû; Eva jî li ser bîngeha vê yekê

ye ku Komara Îslamî di 42 salên derbasbûyî de ezmûn kiriye. Pêka dawî zaniyarî û nûçeyên pêwendîdar bi piroseya binav hilbijartinan li Kurdistanê, di piraniya bajaran de tevî afirandina rewşeke ewlehî û polîsî û hewildana navendên ewlehî bo beşdarîkirina xelkê di wê şanoyê de, xelk amade nebûn beşdariyê di piroseya rewayîbexşîn bi sitemkaran de bikin.

Bo mînak di bajarê Urmîyê de ger di rojên derbasbûyî de caş û bikirêgirtîyan piropagendeya vê yekê dikirin ku xelkê Kurd ên wî bajarî divê deng bidin da ku Kurdistanbûna Urmîyê îsbat bikin, lê netenê rêjeya beşdariya xelkê Kurd gelek kêmtir bû, belkî Azerîyan bi rêjeyeke gelek kêmtir beşdarî kirin.

Ev halete netenê li Urmîyê, belkî di tev ew bajarên ku du netewên Kurd û Tirk bi hev re dijîn berçav û xuya ye. Paşê vê ku derkevt ku şanoya hilbijartinê sar e û bo qerebûkirina kêmasiyan, rejîmê bi xwe ve hat û bilîvê ku lahî û dalahî ji dengûreng û kanalên sêber ên xwe kir, sita-



da binav hilbijartinê rejîmê di daxuyaniyekê de biryareke xwe ya berê ku red kiribû û daxwaz kir ku ev kesên ku wêne li ser nasnameyên wan nîne dikarin beşdariyê bikin; Ev jî piştî wê biryarê tê gorê ku ragihandibûn tenê ev kesane dikarin beşdarî li piroseya hilbijartinê de bikin ku xwediyê nasnameya wênedar bin!

Wan çend fêlên din jî girtine ber xwe da ku bikarin xelkê bikişînine ser sindoqên dengdanê, wan hewil da ku ji darayiya xelkê hejar mifahê werbigirin û nasnameyên wan 150 heta 500 hezar

Tumenî bo dengdan bikirin û ji aliyek din ve jî, binav berbijêran bi telefon pêwendî bi xelkê ve digirtin û soza dana pare bi wan re didan ku beşdariyê di binav hilbijartinê de bikin, hin binav berbijêrên din jî mirîşk û hin kereştîyên xwerinê dibirine ber deriyê xelkê ku bîne ser sindoqên dengdanê.

Lê tevî wan hemû hewilên vala yên rejîmê, ya ku hate dîtin îradeya qahîm a xelkê û “NA” gotin bi teva-hiya Komara Îslamî bû ku di Kurdistanê de gelek berçavtir bû û bi vê yekê şanaziyekek din û hemaseyek din hate afirandin!

Bigiştî ew helmete giştîgîre karî di Kurdistanê de nasnameyeke Kurdistanî bibexşe bi “NA” gotina Kurdistan bi hilbijartina dagîrker di Kurdistanê de, da ku wê wateyê diruşt bike ku Kurdistan bi nasnameya xwe ve her core mîkanîzmekê red dike, ku rê bo dagîrkarî li Kurdistanê xweş bike û di vê navberê de rûreşî tenê bo wan kesan û aliyan maye ku ji bo rejîmê dihol lêdîdan! Lê di heman demê de jî peyamek rohn û êşkere bo xebatkarên Kurd û yên netewên din ên Îranê bi wan bû ku divê qonaxek nû ji xebatê deşt pê bikin, çimkî eva xwaştê gel e.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Xamîneyî ji rewşê tirsîya ye û bi lezûbez ve mijûl e da ku xwe û rejîma xwe rabigire. Tirseke mezin kevtîye di dilê Xamîneyî de û bi sûmet û rengê periyayî ve mêzeyê derdorê xwe dike û zirava wî qetîya ye ku dujmin derz kiribe nav “beyta rêberî” jî û di dawî salên temenê wî de mîrata wî ba bibe û rejîma wî bibe bi toz.

Ji aliyek din ve jî, ew raştî givaşa Potîn û Rûsiyayê hatiye û gotinê, divê her mohreyê ku ser bi Birîtaniya û Rojavayê ye peyda bikî û ji deştilatê dûr bixî. Ji aliyek din jî her roj binkeyeke ewlehî û leşkeriya wî diteqe! Tev tax û qatên xelkê Îranê jî di salên 1396 û 1398`ê yên Rojî de rijiyane ser şeqaman û li dijî Xamîneyî silogan didan.

Xamîneyî ji wan mijarên ku îşare pê hate kirin tirsîya ye û biriyar dabû bi her awayekî be kesek cihê bawerê bike bi Serkomar û kerên xwe pê bispêre û rejîma wî komê ser hev bike û êdî hewcehiya wî bi diholên binav Rêformxwazan nemaye.

Di 28`ê Cozerdanê de, Xamîneyî bi tevahî li hember netewên Îranê sekînan û di raştî de roja 28`ê Cozerdana 1400`an a Rojî guherinkariyeke bingehîn di dîroka Îranê de bû.

Yekem guherinkarî pêk hatibû ji, ger heta duh di binav hîlbijartinan de, di nav xelk an bandên deştilatê de derz û arîşe peyda dibûn, lê vê carê arîşeya wê rohîntir û taybetmendiya vê corek din bû.

Ger berê civatgeh rastê derzîkirinê dihat û li ser vê ku

Qonaxa hilûşînê



beşdarî bikin û nekin û dengê bidine wê aliyê yan aliyê din, cudahî di nav wan de hebû; Vê carê tev civatgeh bi yekdengî li hember rejîmê sekînanidin û mesele bigiştî berevajî bû û bi awayekî ku derzek mezin kevtî nav xelk û rejîmê de. Di vê qonaxa dîrokî de evên ku banghêjî bo beşdarîkirin û dengdan bi rejîmê kirin di dîrokê de rûkê wan reş bû.

Guherîna duyem, cihguherîna rejîmê û opozîsiyênê bo peyvîn digel xelkê û handana wan bû! Di salên berê û dewrên binav hîlbijartinê de, opozîsiyona raşteqîne ya rejîmê, divêya hewil û têkoşîneke zêde bidabana da ku xelkê bigihînin li ser vê bawerê ku di şanoya hîlbijartinê de beşdariyê nekin û di vî werî de arîşe û aştengiyên zêde li ser rêya wan hebû. Rejîmê jî bi hêsanî hereket û aliyên girêdayê xwe erkdar dikir ku xelkê bo ser sindoqên dengdanê han dide! Di dewreyên berê de dengê opozîsiyona raşteqîne bi kêmî û lawazî dihate bihîştin û rejîmê jî bi bêhneke fireh ve pişta xwe dida textê hakimiyeta xwe!

Di 28`ê Cozerdanê de, meşa hîlbijartinê bi tevahî berevajî bû. Opozîsiyona raşteqîne behs ji beşdarînekirin û baykotê dikir û rejîmê jî bi tevahî kevtibû hewildanê da ku xelkê han bide ku cardin raştî fêl û lêbxwarinê bèn!

Hereketên ser bi rejîmê jî, bi tevahî karê wan giran bû û ji her deriyekê didan ku belkî tiştek bikeve deştê wan, lê raştî kêmtirîn bersivan dihatin! Di vê dewreyê de dengê opozîsiyon û dijberê rejîmê bi tevahî bilind bû û dengê rejîma Xamîneyî û karbideştên wî gelek lawaz bû! Roja 28`ê Cozerdana 1400 a Rojî, guherîneke dîrokî bû ku netewên Îranê bi yekdengî û tev xelkê Îranê dengê dijberî bilind kirin û bi baykotkirina şanoya rejîmê hawar kirin ku ti pêgeheke Xamîneyî û rejîma wî nemaye û qonaxa hilûşîna wê rejîmê deşt pê kiriye.

Xebata rizgarîder, xwe organîzekirin û damezrandina yek “hêza pêşmerge”



N: Elî Munezemî

Xala hevpar ya bingehîn û sentral di navbera endamên partiyên xebatkar di Rojhilatê Kurdistanê de, kurdbûn û xebata wan ya bo azadiya Rojhilatê Kurdistanê ye. Ev heşta hevpar a netewehez û nîştimanperwer cesaretê dide endamên wan partiyên û wan teşwîq dike ku sexmeratî endambûna wan li partiyên cihê reng de, xwe li hevûdu nêzîk û ser bi yek koma mez-intir an ku Kurdistanê bibînin. Ev heşta hevpar a wan bi hev re girêdide.

Lê bo wê hindê ku ev hevpariya neteweyî bikare hander be û hêz û hereketên Kurdî lihev nêzîk bike û nemaze cihêrengiya hêz û şiyana wan bike yek û bêxe xizmeta xebata rizgarîx-waziya neteweyî, dibe hizrek siyasî banghêjiyê li ser hevpariya wan bike û xalên bicih bêxe bin sîbera wê hindê ku neyên xuyakirin, meydana siyasetsaziya Rojhilatê Kurdistanê bêxe bin bandora xwe.

Yanî hêz û hereket û saziyên siyasî, kultûrî û civakî wek yekîneyekê bikevin xizmeta hizra neteweyî ya rizgarîderê. Bo wê hindê Rojhilatê Kurdistanê hevceyî bi damezrandina hin ji saziyên neteweyî heye ku li serweyê partiyên siyasî cih bigre.

Bi awayekê wek hikûmetek «de facto» bikare bixebite. «Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê» eger çî pêngavek baş bo lihevnêzîkirina hindek partiyên siyasî di Rojhilatê Kurdistanê de bû, lê ew saziya bi tinê nikare bersivderê hemû karûbarê xebata neteweyî di Rojhilata Kurdistanê de be. Dibe em bi şeweyeke damezraveyî xebata neteweyî di Rojhilatê

de birêkxistin bikin û bikare hêza mirovî û hemû îmkanatên me bi baştirîn şêwe di bêxe xizmet xebata netewî de. Bixasmanî ku Rojhilatê Kurdistanê di wê rewşa aloz û bin sîbera dagîrkariya Îranê de ye, gelek îmkanatên wisa nînin ku em jî bi sedema kanalîzenekirina baş a wan îmkanatan bibin sedem ku ew îmkanat jî ku hene, heder herin.

Bo vê ku xebata Kurdan di Rojhilatê de xurt bibe, bandora hewce hebe û wek wezneyek di hev kêşeyên siyasî de hisab li ser bê kirin, me pêwîstî bi parlemana hevpar, dezgeha birêvebirina hevpar, dezgeha dadweriya hevpar, ragihandina hevpar, dezgeha dîplomasiya hevpar û li hemûyan girîngtir, yek hêza çekdar û dezgahek hewalgirî ya hevpar heye. Ew yeka li zaf pîrsgirêkên ku dikarin di pêşerojê de bêne ser rêya me, niha de tune bikin. Jiber ku kurd di Rojhilatê de bikare hikûmetek «de facto» ava bike, pêdivî ye ku me makezagonek a demkî hebe. Navenda Hevkariyê dikare wî erkê giran bigre stuyê xwe û li ser şeweya hukumraniyê, parvekirina desthelatê û saziyên sereke yên pêdivî makezagonekê amade bike. Damezrandina “Hêza Hevpar a Pêşmerge Kurdistanê” yek ji karê girîngtirin e wan saziyan e. Jiber ku “Hêza Hevpar a Pêşmerge Kurdistanê” ku erkê wê di dema xebata rizgarîxwazî de, derêxistina dagîrkeran li Kurdistanê û paraştina axa û xelkê Kurdistanê ye, nikare hêzek hizbî an ya partiyek xasmanî be.

Hêza Pêşmerge Kurdistanê dibe hêzek netewî û xelkî be û bi emr û fermana hikûmetê hereket bike. Partiyên siyasî û xebatkar li Rojhilatê Kurdistanê de bi komkirina hêz û qaweta xwe û kanalîzekirina baştir ya îmkanatên xwe yên merivî û maddî, dê bikarin zêdetir li caran derbê li dujmin bixe û serkevtin û destkevtên baştir bo şoreşê bi dest ve binin. Ev yeka ji ber vê yekê girîng e ku siyaseta



dagîrkeran li hember netewe û welatê Kurdan, li ser tundûtîjiyê hatiye danîn û li nebûna hêzek berevankar a xurt de, em rastê komkujiyan û kavilkirina gund û bajaran hatine.

Evrên xwîn û agir her tim li ser serê kurd û Kurdistanê bûye, pêdivî ye ku Kurd jî bi xwîn û agir di hember de xwe bi-parêzin. Kurd di Rojhilatê de bi bikaranîna şiyana û potansiyela xwe dikare di warê çekdarî de bi şiklekê xwe birêkxistin bike ku hem bikare xwe biparêze û hem derbeyên giran li dujmin bide. Em dibe siyasîetên paraştin, ewlehî û zerbelêdan li dujmin li serwetir ji hemû siyasîetên din dabinên.

Rola “Hêza Pêşmerge Kurdistanê” di wê hindê de, rola ser-ekî ye. Pêşmerge di dîroka gelê me de hertim erkê pîroz ê parêzvaniyê li ser milan bûye. Lê dibe em jî bikarin li qonaxa “pêşmergeyên hizbî” derbas bin û pêngaveke micid hildin bo ku “pêşmerge yên Kurdistanê bin”. Pêşmergeên Kurdistanê dikarin neteweyîtir û nîştimanîtir bixebitin. Dîroka xebata rizgarîxwaziya hemû neteweyan vê raştiyê piştrastî dikin ku rizgarî û azadî û paraştina azadiyê bi yekîtiya hêz û partiyên wan yên xebatkar bûye. Bi wê hêviyê ku «Hêza Pêşmerge Kurdistanê» jî di Rojhilatê Kurdistanê de bibe xwediyê şad, fermandehî û wek yek rêkxistinê were organîzekirin.



91'emîn salroja şehîdkirina rêber û bavê nasyonalîzma Kurdî



N: Dara Natiq

91 sal beriya niha rêber û bavê nasyonalîzma Kurd an ku “Simkoyê Şikak” li bajarê Şinoyê yê Rojhilatê Kurdistanê bi biryara şahê wê demê yê Îranê, Riza Şah ve ji aliyê hêzên dagîrker yê Îranê ve hate şehîdkirin. Lê bandora serhildana rizgarîxwazî a rêberê ticar nemir yê netewa Kurd heya niha jî li Rojhilatê Kurdistanê û bi taybet li herêma Urmîyê maye û rêvîngên rêbaza Simkoyê nemir di pêxema rizgarî û serbestiya axa bab û kalên xwe de hertim xebata xwe didomînin. Smaîl Xanê Şikak, ku di nav Kurdan de wek Simko an jî Simkoyê Şikak tê naskirin di sala 1887'an de li bajarê Selmasê û li gundê Kela Çariyê hatiye dinê.

Îsmaîl Axayê Şikak yê ku piranî bi navê (Simko an jî Simkoyê Şikak) di nava Kurdan de hatiye naskirin, yek ji wan rêbera ye ku di dîroka azadîxwaziya gelê Kurdistanê de xwedî rûmet û xebatek berçav e. Girîngiya serhildana Simkoyê Şikak ku nêzî 25 salan dom kir, di vê raştiyê de ye ku piştî şerê cihanê yê yekemîn nêzî ji %50 axa Rojhilatê Kurdistanê li jêr desthilatdariya dewleta navendiya Îranê rizgar kir û mîna desthilatdarekî Kurd karê xwe yê hukkîmariyê dimeşand. Ev karê han (ku Simko karî hemû hêzên êl û eşîretên Kurdan li dora hev bicivîne), di wê serdema ku sistema feodalîzmê li hemû Kurdistanê di bin nîrê axatiyê de bû, karekî wiha hêsan nebû.

Piştî şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehirî (1880'an a Zayînî), serhilada Simaîl Axayê Şikak di Rojhilatê Kurdistanê de şoreşa herî mezin û domdirêj tê hesibandin.



Di çaxê vê şoreşê de bû ku kesayetiya tehqîrbûyî ya Kurd wek netewekê, hinekî bişkivî û hissên neteweyî di nava Kurdên vê perça Kurdistanê de zêdetir ji berê zindî bûn. Kurdan karî wek netewe hebûna xwe di hemû Îranê de bidin selmandin û berevajî xwesteka şovînîstên Faris, hurmeta xwe ya civakî û siyasî wek mîrasekî dîrokî biparêzin. Ji bona wê jî nivîskar û dîroknan Kirîs Koçêra, Simkoyê Şikak bi (bavê nasyonalîsima Kurdî) di Rojhilatê Kurdistanê de binav dike.

Simko ku gelek kes herketî wî bi bizavek eşîretî û herêmî dihesibînin, li gor pîvanên wê çaxê mirovekî zana bûye û haya wî ji siyaseta Îran û cihanê hebûye. Simko bi nameya ku bi rêya serleşkerê Îngîlîzî ji Zefêr el Dule re şandbû, vê raştiyê baştir bi me dide selmandin. Simko di pareke nameya xwe de dibêje: “Em pir baş dizanin ku hinek netewe di cihanê de hene ku hejmara wan nagihe çariyek (1/4) a Kurdan, lê ew gihîştine xwezîyên xwe ku mafê otonomîyê ye. Li Elmanan binêrin ku çawa ev karê han di nava xwe de pêkanîne. Biraştî ger netewa Kurd di Îranê de negihîje mafê xwe, êdî mirin û neman jê re baştir e ji jiyan û mayînê. Di vê roja ku em têde dijîn, dewleta Îranê bixwaze an jî nexwaze, em mafê xwe yê otonomîyê dixwazin. Êdî ev xwezîya hemû mirovekî Kurd e û ji

xelkê me re jî jiyanê nû ye. Ev name dide diyarkirin ku Simko mirovekî dîrbîn bûye û ji bo standina mafê rewayê gelê Kurd bi armancên mezin û pîlanên nû dest bi xebata xwe ya siyasî kiriye.

Simko dixwest bi dewletên wek Bîritaniya û Soviyetê re têkilî deyinê û bala wan bikşîne ser pîrsgirêka Kurdistanê. Lê van dewletan ji ber berjewendiyên xwe yê aborî û siyasî bi dewletên serdest yê Kurdistanê re têkilî danîne. Ji bo bi Soviyetê re têkilî dayinê di sala 1922'an de nûnerekî xwe şandibû Bakûyê ku bi Soviyetê re têkilî deyinê. Lê Soviyetê di 26'ê Sibata 1922'an de bi Şah re peymana dostaniyê mor kiribû û li ser vê yekê dev ji piştgiriya serhildana komunist ya Gîlanê berda bû.


Simko bi taybetî bi rêya Seyîd Teha re xwestiye ku bi berpirsiyarên Îngîlîz yê di Îraqê de ji bo çareserkirina pîrsgirêka Kurdistanê û damezrandina dewleteke Kurdî hevdîtinan pêk bîne. Lê Îngîlîzan di hevdîtinên xwe yê bi Simko re hewldanekî wiha nîşan nedane. Simko di derbarê Îngîlîz û Tirkan de wiha digot: “Îngîlîz û Tirk ji bo çareserkirina pîrsgirêka Kurdistanê derewan dikin. Ew me dixapînin. Îngîlîz dixwazin Kurdan ji bo armancên xwe wek xulam û bendeyan bikar bînin. Wek meymûnan me bireqisînin û bi me bikenin. Lê ez xiyanetê li gelê xwe nakim. Tirk û Îngîlîz ji

hev xirabtir in. Lê ji herkesî zêdetir Kurd ji hev re xirab in. Ew piştî hev nagrin, hînî xizmetkariyê bûne, baweriya wan bi wan tineyê û meznatiya hevûdû napejrînin.”

Ramana nasyonalîstî û pêşketinxwaz ya Simko bi vekirina yekemîn Komeleya Cîhandana Kurd û bi derkirina yekemîn rojnameya Kurdî di Îranê de bi alîkariya Ebdulrezaq Bedirxan û 20 sal xebat û di encamê de bexşîna can û malê xwe di rêya damezrandina dewleta serbixwe ya Kurdî de, çi xizmetek ji dîroka xebata teji serfirazî a neteweya Kurd kiriye.

Lê mixabin Simkoyê Şikak jî weke Cewer Axayê birayê xwe, ji hêla dujmanan ve tê xapandin û dikeve telika Îraniyan û roja 21.06.1930'an de, bi xwe û Xurşîd Axayê Herkî şehîd dibin û Xusroyê kurê wî jî bi birîndarî penayê ji bo Turkiyê dibe. Bi vî awayî, piştî 25 salan xebat li dijî desthilata Qacara û Riza Şahê Pehlewî, Simko şehîd dibe. Termê Simko çend rojan di nava bajarê de hatiye gerandin, heya xelkê pê bihê çavtirsandin. Dawî Di bîranîna şehîdbûna Simkoyê Şikak de, tevî tewandina serê rêz û wefadariyê li hember canê nemir yê Simko û hemû şehîdên rêya serbestiya neteweya me ku bi xebata xwe rûmet û serfiraziyek heta hetayî ji bo neteweya me tomar kirin, em wan piştraştê dikin ku ala xebata wan heta serkevtinê dê geş û bilind bibe. Em hêvî dikin di pêşerojê de nêzîk de dara xebata Simko, Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û tevî şehîdên Kurdistanê Rojhilatê ber dide û wê demê divêt peykerê her yek ji wan şehîdan li wan cihên ku wan şehîdan bi salan di pêxema paraştina nasnameya Kurdistanê bûna wan û avakirina desthilata neteweyî jê re xebat kirine, were sazîkirin û mezarên wan rêberên leheng û gernas bibin ziyaretgaha evîndarên rêya rizgarî û serbestiya Kurd û Kurdistanê.

Bercam, yan derbasbnûna terorîstan ji krîza aborî



N: Serbest Urmiye

Aloziyên di navbera Emerîka û rejîma Îranê yên li dor bernamêya navkî ya Îranê de, piştî hatina "joe Biden" Serkomarê vê gerê yê Emerîkayê, yê derbasî qonax-êke nû bûne ku heya pitir ser tê gotin, pitir her du alî ber hev disekin. Bi terzekê ku paşvekişiyên û lihevhatin li dor vê pirsê, her du aliyên him ji aliyê hundir û him jî ji aliyê derdor ve ber bi rûyê arîşe û gazindayan ve diçin. Lihevhatina ku di dema wajokirinê de li dor çalakiyên navkî yên rejîma Îranê bû, niha aliyên berfirehtir ji xwe digire.

Îran di vê gera danûstandinê de çi dişopîne?

Piştî derketina dewleta "Donald Trump" li "Bercam"ê, meclisa Îranê jî di kiriyareke hemkûf de li Payîza sala 1399'an a Rojî û li ser navê hewlên karsaz ji bo hilgirtina dorpêçan û berevanî ji mafê xelkê Îranê, dewlet neçar kir ku pêşiyê li çavdêrên Ajansa Navnetewê yên Vizeya Navkî bigire û car din çalakiyên meyandina Uraniyomê di asteke berfireh de bidomîne. Lê ya balkêş eva ye ku gelo çima rejîma Îranê amade ye vegere ser maseya gotûbêjan? Li gor ya ku şarezayê aborî dibêjin, nizimbûna ji %85 ya rewşa aboriya Îranê yek ji wan hegerên sereke ye ku gumana vê yekê çêdike ku rejîmê di aliyê navxweyî de rastî alozî û nerazîbûnan bîne, lewma neçar dimîne were vegere nava basê de.

Rejîm di rewşa nizm a aborî de, ne tenê ji aliyê gel ve dikeve ber êrîşan, belkî hegera vê hindê jî zêde ye ku di encama dabînnabûna aborî de hin taqim û destekên girêdayê bi wê di herêmê de jî, jê veqetin ku ev yek jî dikare



bibe hegera vê hindê ku karta zexta rejîmê di herêmê de weke hercar bihêz nemîne. Lewma rejîma Îranê hewil dide ku sînorê lihevhatina han ji çalakiyên xwe yên navikî derbas bike û xwe ji wan krîzan jî derbas bike ku bi sedema bînpêkirina mafên mirov, terorîzma dewletî û piştevanî ji terorîzmê û...hwd, bi ser de hatine.

Xwesteka rejîmê di vê gera danûstandinê bi dewletên 5+1 re eva ye ku hemû dorpêçên li ser rejîmê bi yekcarî werin rakirin. Lê ev yek bo aliyên din yên pirsê, bi taybetî Emerîkayê cihê ramanê ye. Jiber ku parek ji dorpêçan girêdayî ne bi pirsê terorîzmê û Spaha Pasdaran terorîst ve. Ji aliyêke din ve jî dorpêçdanîna li ser sîstema bankê, bingeheke aborî, neft û petrokîm yên Îranê, ne girêdayî bi pirsê navikî ve ne. Belkî bi sedema piştevaniya aborî û dabînkirina çavkaniyên aborî bo terorîzma Îranê û taqimên terorîst ên girêdayî bi rejîmê ve ne. Eva yek ji wan pirsan e ku heke were pejirandin, dikare buhayê giran danê ser destê dewleta Emerîkayê û him di hundir de û him jî ji aliyê hevalbendên wê ve rastî arîşeyan bike. Ji aliyêke din ve rakin dorpêçên girêdayî bi pirsê bînpêkirina mafên mirov ve jî bo dewleta "joe Biden" diwar e. Di rewşêke wilo de ji destpêkê de "joe Biden" divê ku bersivê ji Komarîxwazên Emerîkayê re hebe.



Şerê derûnî û teknîka direwa mezin



N: Dr. Mihemed Husênzade

W: Keyhan Mihemedînjad

Herçîqa ku direw yek ji kevintirîn teknîkên şerê derûnî ye, lê di niha de bi awayek berçav û berbelav bo piropagende û nemaze ji rêya mediya û torên civakî ve mifah jê tê wergirtin. Dewlet hem dikarin di asta navxweyî li dijî xelk û part û aliyên opozisiyon û hem di derveyê sînoran de li dijî dujminan û neyarên xwe bo çewtekarî an tohmetlêdan an perdeşopkirin an her mebestek din be, ji direwan mifahê wergire. Lewma bi salan e ku direw bala şarezayên şer bo aliyê xwe rakêşaye û lêkoler girîngiyek taybet bi wê siyaseta didin.

Gelek mînak ji ber deşt de hene ku vê yekê nîşan didin, gelek ji deştîladar û welat ji alava direw bi mebesta dabînkirina hin ji berjiwendiyên taybet mifahê werdigrin. Di vê navberê de yek ji siyasatên rejîma Îslamî ya Îranê li dijî netewa Kurd çî li Rojhilatê Kurdistanê û çî li beşên din, siyaseta şerê derûnî û nemaze cîbicîkirina teknîka “direwên mezin” bi merema xelilandina raştiyan, perdepoşî, şikandina Kurd, bêrêzîkirin bi nîşaneyên netewî ên Kurd an mebestek din a diyarîkirî bûye û mixabin heta asteke di vî warî de serkevtî bûye.

Em dikarin di pênaseyek kurt û hêsan de bêjin, direw axavtinek rast nîne û bi mebesta çewtekarî ye. Direw, îdia an axavtinek pûç an berevajî raştiyan ne ku direwker hewil dide bi mebesetek taybet wek raştiyan û heqîqetê nîşan bide û cihgirê wan bike. Herwisa ku me got di şanoya siyaseta de direw teknîkeke şerê derûnî ye, û nemaze ku hekî ew direw gelek mezin be. Direwa mezin ku bi direwa



“Gublz” navûbang peyda kiriye, hem deştewaje ye û hem jî teknîkek e ku yekem car ji aliyê “Hîtlêr” ve mifah jê hate wergirtin û nûnerayetiya teknîkeke warê piropagende di siyaseta de dike. Yekek ji rêyên bandordar li ser berdeng, belavkirina zaniyariyên direw û araştêkirî an xistîne rû ya wêneyek berevajî ji raştiyê ye ku gelek caran bi nîşandana beşek ji raştiyê an bijardeyek ji raştiyê wê karê encam didin. Direw di demekê de serkevtî dibe ku berdeng wek raştiyê qebûlê bike.

Bo wê karê jî zaniyariyên serî û şaş bi hev re têkel dikin û berhema wê tiştek nû ye û berdeng dikeve bin bandora wê û wek raştiyê çav ji direwê dike. “Hîtlêr” di pirtûka “Xebata Min” de dibêje, sedema vê ku xelkê Almaniyayê li şerê yekem ê cîhanê de şikest qebûl kirin, eva bû ku Cihûyan di mediya û rojnameyan de deşteke bilind hebûn û ji vê

teknîkê mifah wergirtin. Ji dîtingeha Hîtlêr ve bo mifahwergirtin ji vê metodê hewce ye, direwkin ev hinde mezin be ku kes bawer neke “kesek ev hinde rûçir e ku bi vê bêheyayiyê ve raştiyê biguhere”. Lewma Hîtlêr dibêje: “Di direwa mezin de hertim hêzek heye ku direwê wek raştiyê dide xuya”.

Piştî “Pail Cozêf Gublz” Siyasetvan û Wezîrê Piropagende yê Hîtlêr li derheq direwa mezin gotiye, direwa mezin yek ji metodên piropagendeya Bîrîtaniyayê ye, û Bîrîtaniyê direweke mezin dikin û berdewam li ser wê tekezî dikin û dûbare dikin.” Xala balkêş eva ye ku direwa mezin divê evqas mezin be ku hem bibe karlêkeriyeke ecêb û hem bandorê li ser xelkê danê. “Gublz” di vê derheqê de dibêje: “Direw çende mezin be, bawer-pêkirin hêsantir e”. Vê diçe sedema vê jî eva be ku ti kes bawer nake ku kesek bikare wiha çîrokekê çê bike.

Li derheq vê xalê jî “Gublz” dibêje: “Bila direwa we evqas mezin be ku ti kes jîratiya vê yekê nebe ku bîr jê bike û wê bike bi direw”. Helbet Gublz vê yekê jî dibêje, ku hekî hûn li ser direwa xwe pêdagiriyê bikin, di dawiyê de xelk baweriyê pê dikin. Lewma bi vî awayî pêşniyar dike, “direw bike, direw bike heta ku bawerê bi te bikin, paşê direwê bike heta ku bawerê bi xwe dikî”. Gublz bixwe bi kiryar ev yeka peyrewî kiriye û di vê derheqê de dibêje: “Min hin caran hin direw dikirin ku ez bixwe jî, ji wan ditirsiyam”. Cihê îşarepêkirinê ye ku tê gotin, xwedê baskirina Gublz li derheq Bîrîtaniyan bi bê îşarekirin bi çavkanî, birojîrîn mînak mifahwergirtin ji direwa mezin e, lewma hin ji şareza li ser vê bawerê ne ku “Gublz” bixwe dahênerê direwa mezin be.

Di siyaseta navdewletî de gelek caran ji vê teknîkê mifah hatiye wergirtin. Bo mînak kê mînin ev bîr-mendên ku wisa dizanin, Amerîka di şerê xwe digel Îraqê ya sala 2003an de, ji siyaseta direwa mezin a derheq hebûna çalakîyên etomî û çeka neasayî di Îraqê de mifah wergirtiye, di halekê de çavdêrên navdewletî ku di vî welatî de erkê vekolînê hebûne, ev yeka red dikirin. Şêwazên belavkirina direwên mezin berfireh û cur bi cur in; Di serdemê me de mediya û torên civakî baştirîn emraz û alavên belavkirina direwa mezin in.

Mediya û kanalên ragihandinê hewil didin bi belavkirina dengo an direweke taybet armancek diyarîkirî nîşan bigrin. Dema ku direwa mezin belav dibe xelkeke zêde çî evên pesend û qebûl dikin û çî ev kesên ret dikin û bertekê nîşan didin, mijûlê xwe dike. Pirsgirêk eva ye ku direwa mezin nayê berhevdan û mediya dikarin bi hêsanî bixine nav mêjiyê takan û bigihin bi armancên xwe.

Nerîna Lîderan



“Mîstefa Hicrî”:

“Tevî pîlan û gefên berdewam ên rejîmê, kêmtirîn rêjeya xelkê Rojhilatê Kurdistanê çûne ser sindoqên dengdanê, ew wekî peyameke “NA”ya bi hêz a dinê ye bo wê rejîma dijîgel”.



“Naftali Bennett”:

“Elî Xamineyî Serkomarê nû hilbijartiye ne xelkê Îranê û hilbijartina Îbrahîm Reîsî wek Serkomar, zenga metirsiyê ye bo welatên cîhanê”.



“Barbara Woodward”:

“Beşek ji pirsgirêka nav Sûriyê de Îran e û çalakiyên girûpên ser bi Îranê di Sûriyê de, hem karê welatên Rojavayî û hem yê Sûriyan diwartir kiriye”.



“Îbrahîm Reîsî”:

“Ez digel Co Baydin hevdiştinê nakim”.

Reyîsî ji bo 4 salan yasaya parastina dîplomatan lixwe digire!



N: Eskender Ceiferî

Îbrahîm Reyîsî weke ku dihat pêşbînîkirin jî, ji aliyê rejîma Îranê ve weke Serkomar hate destnîşankirin.

Êdî ew heya 4 salan di asta navdewletî de yasaya parastina dîplomatan lixwe digire û ti kesek li welatên derve nikare ji ber darvekirina hezaran çalakvanan lêpêçînê li wî bike.

Ji sala 1979'an ve heya niha 13 gerrên hilbijartinên Serkomariyê li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendam. Belkî sedemek ji hêncetên baykotkeran jî her ev e. Di 12 gerran de 8 kes weke Serkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tiştêkê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Di salên di navbera 1979'an de heya 1981'an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî Serkomar bûn. Lê Serkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981'an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên Serkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedîniyad her yek du salan Serkomar bûn. Tevî ku Serkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedîniyad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car

din xwaştin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin. Di hilbijarinên sala 2009'an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedîniyad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasîyê, gelek dangan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedîniyad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 42 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwedîya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017'an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê biştînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingeşîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwedîyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dangan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve


di bin givaşên Xumeynî de hate dîrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li piştî Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de piştî Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dîrxistina wî ji posta Serkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwaşt bibin berendamên Serkomariya Îranê. Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009'an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedîniyad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dangan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Kurd dibêjin eger Dr. Ebdulrehman Qadimlû serkirdeyê Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê û Fuad Mîstefa Sultanî serkirdeyê Komelê bikariya mafê xweseriyê ji bo Kurdan ji Tehranê biştînin berî ku bîne terorkirin, di karîbûn bibin namzedên Serkomariya Îranê jî. Ew dibêjin Komara Îslamî hewl dide hemû hêzên opozîsyonê, dijberên xwe û serkirdeyên wan jinav bibe. Fuad Mîstefa Sultanî sala 1979'an li nêzîkî gundê Beştam li ser riya di navbera Bane û Merîwanê de hate terorkirin. Dr. Qasimlû jî sala 1989'an li Wiyena paytexta Austriya ji aliyê terorîstên Îranê ve hate terorkirin.

Tiştî ku balkêş e, yasayên navdewletî ji bo parastina teroriştan e. Îbrahîm Reyîsî ku destê wî di davkirin û kuştina hezaran azadîxwazan de hebû, niha weke Serkomarê rejîmê, heya 4 salan yasaya parastina dîplomatan di asta navdewletî de lixwe digire.

Siyaseta Biden û bazarên Turmp



N: Ebdulazîz Qasim


Gelek şirovekar û çavdêrên siyasî pêşbînî dikirin ku di hevdîtina “Joe Biden” û “Vladimir Putin” de, hin bazar yan jî rêkkeftinên duqolî di navbera Rûsiya û Amerîka de li ser doseyên girîng li Rojhilata Navîn bibin, wekî heman rêkkeftin û bazarên “Doland Turmp” Serokê berê yê Amerîkayê digel dewletên din.

Raşt e, ku heta niha hûrgiliyên wê hevdîtînê nehatine ragihandin, her wekî çavdêrên siyasî yê Erebb Mustefa Fahs di gotarekî de daye zanîn ku hevdîtina “Biden-Putin”, ya ku 4 demjimêran dirêj kir bi tenê ma di çarçoveya wêne kişandinê de, bi wateya ku tiştek ji naveroka wê hevdîtînê nehatiye ragihandin.

Lê heger em vegerin li ser gotûbêj û rojeva komcivînên van çend rojên borî yên “NATO” û herwiha “G7”, dê bo hin xalên girîng yên siyaseta nû ya Amerîka û herwiha ya Rojavayî zelal bibin û herwiha ku hin nehîniyên kombûna “Biden-Putin” jî eşkere bibin.

Dûr nîne ku dibe car rêkkeftin û tēgihiştin li ser hin mijaran di navbera Rûsiya û Amerîka de peyda bibin, lê ev yek nayê bi wateya ku Amerîka wê bi heman reftar û lojîka Trump serederiyê digel dijberên xwe bike, herwiha dibe ku siyaseta xwe digel hevpeymanên xwe jî biguherîne, bi taybetî li hember Tirkîya ku li ser du werîsan dilehîze.

Tevî ku heta niha hêj siyaseta nû ya Amerîka eşkere nebûye, lê bi piştrastî dikarin bêjim ku siyaseta derve ya rêveberiya “Joe Biden” wê berevajî siyaseta rêveberiya



Trump be, herwiha tē pêşbînîkirin ku beravajî siyaseta Obama jî be, lewra ev yek hem dijber û hem dostên Amerîka tēxe di bin destûbareke nû de, û bi dîtina min dibe ku guhertina li Îsraîl û bi dawîhatina desthilatdariya Serokwezîrê Îsraîl “Benjamin Netanyahu”, di çarçoveya siyaseta nû ya Amerîka û Rojavayî de be.

Rojên tēn wê siyaseta Amerîka ya nû zelaltir bibe, û bi bawerîya min Tirkîya û Îran wê bikevin di nava qeyranên mezin de, bi taybetî ku doxa Îranê ya siyasî û aborî xirabtir dibe û heta rêkkeftin li ser bernameya wê ya navkî wê ji alozî û krîzan rizgar nake.

Zêdetir wiha jî di vê çarçoveyê de, hêjayî gotinê ye ku Serokê Fransa “Emmanuel Macron”, dúbare daxwaza bi dawîhatina dagîrkeriya Tirkîyê li ser bakurê Sûriyê di civîna NATO û di hevdîtina digel Erdogan jî kiribû, bi dîtina min ku bazarên Erdogan-Putin-Turmp li ser Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê di demek nêzik de dê pûç û betal bibin, û dê Tirkîya li ser hevkarîya bi Îran û Rûsiyayê re û herwisa li hember siyaseta dijminatîya gelê Kurd li Sûriyê û bi taybetî li ser dagîrkeriya Efrîn û Girêspî û Serêkaniyê û tawanên qetilama gelê Kurd wê bikeve di aloziyên mezin de û nemaze piştî radeştîkirina zêrevaniya firokxaneyê Kabol û hêzên NATO li Afxaniştanê bo Tirkîyê, ku bazarên Tirkîyê digel Rûsiya û Îranê li ser Sûriyê bikevin di bin metirsiyê de.

Hewlên Tirkîyê ji bo dúbarekirina tēkliyên xwe digel dewletên Erebbî û herwisa digel Îsraîl heta niha sernekevtine, û niha kar dike ku opozisyona Sûrî “Îtîlaf” ji rengê wê yê Îslama radîkal bike rengêkî “aşîretî” û nûçeyek heye ku Tirkîya wê di demek nêzik de, hin tēkiliyan bi partiyên Kurdistana Sûriyê re diruşt bike, û bi dîtina min her danûstandinek digel Tirkîyê bēyî merc û beyî karname ji aliyên Kurdî bihê qebûl kirin, dê zirar û ziyaneke mezin bigehîne doseya navçeyên Kurdî yên dagîrkirî, nemaze ku heta niha Tirkîya û opozisyona Sûriyê “Îtîlaf” berde-wam in li ser guhertina demografî û qirkirina gelê Kurd li Efrîn û deverên din yên dagîrkirî.



Bi sedema xemsariya bajarvaniya Urmîyê, zarokekî canê xwe ji dest da

Li taxa Elwaca bajarê Urmîyê, zarokekî 3 salî yê bi navê “Feryad” li nav ava kanala averoya wê taxê de xendiqî, çendîn sal e ew kanala averoyê bê perjîn û servekirî ye.

Pêka gotina xelkê deverê Feryad rojek berî salvegera ji dayîkbûna xwe li nav ava averoyê de xendiqiye.

Bi sedema Xemsariya bajarvaniya bajarê Urmîyê li taxên derdornişîn, çendîn sal e tevî bêhna pîs û belavbûna nexweşîyan li demsala germayê de, li ser canê zarok û kalan jî gefek micid e, heya niha bajarvaniyê ti bernamemek bona çareserkirina wê pirsgerêkê tine bûye û bi tenê berpirsên pêwendîdar sozên çewt dane xelkê, û bi taybet li dema hîlbijartinan de sozên rengareng û çewt li ser ave-dankirina wan taxan didin.

Taxên wekî Elwac, Kuştargah, Gire Cihû, Îslam Abad, Husên Abad û Elî Abad û çendîn taxên din li bajarê Urmîyê ji piraniya



xizmetkariyan bêpar in û berpirsên rejîmê piştî çendîn dehikan hêj ti karek bo xelkê wan taxan nekirine.

Bilî vê ku ev averoyên wan taxan canê zarokê welatiyan jê diştine, bêhna wan a gemar jî arîşe bo xelkê afirandiye

Hêzên Spaha Psdaran li devera Jaweroyê givaş xistine ser xelkê



Pêka zaniyariyên ku gihîştine bi malpera “Kurdistanmedia”yê, li gundê “Mêraw”ê girêdayê devera Jaweroya bajarê Sinê, Spaha Psdaran bi rêya balafirên bê pilot, çavedêriyê li ser hatûçûya xelkê dikan.

Pêka wan zaniyariyên xelkê ku hêzên Spaha Psdaran bi hêceta amadebûna pîşmerge, li nav zewiyên werzîriyên xelkê digerin û bo xelkê pirsgerêk afirandine.

Hevdem hejmarek li caş û bikirêgirtiyên rejîma Îranê li bajarê Seqizê bi serûçavên weşartî li nav xelkê de digerin û tirs xistine nav xelkê.

Welatiyekî kurd ê binçavkirî piştî lêpirsînê bo girtîgeha bajarê Urmîyê hate veguhaştin



Roja Pênşemî 27'ê Cozer-Rdanê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Nayîb Eskerî”, xelkê bajarê Urmîyê, piştî lêpirsînê ji girtîgeha Îtla`at a Spahê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatiye veguhaştin.

Ew welatiye li roja Şemî 7'ê Xakelêweya îsal, bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ji

aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêpirsînê bo girtîgeha Îtla`at a Spaha Psdaran li bajarê Urmîyê hatibû veguhaştin.

Tohmata ku bi ser “Nayêb Eskerî”, de sepandine, “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” hatiye ragihandin.

Rola dengbêjiyê di parastin û veguhestina zimanê Kurdî de

Dema ku em behsa civaka Kurd bikin, Kurdî û dengbêjî li kû derê digihên hev û ji ku ji hev dikarin bîn cuda kirin, gelek zehmet e. Bi taybet li Bakurê Kurdistanê di salên dawî de li gel ku daxwazên ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û perwerdehiyê sazûmanbûnek û hewldanên berfireh hene, ji aliyê din de jî ew şopa ku zimanê Kurdî heta niha paraştiye û veguhestiye, dengbêjî bi metirsiya nemanê ve rû be rû ye. Li Diwanxaneyê Dengbêjan a Wanê dengbêj û şagirtên xwe bersiva pirsên me dan.

Li gel ku zimanê Kurdî, di nav dewlemendtirîn zimanên Cihanê de ye û yek ji qedimtirîn zimana ye, bi sedan sal e jî zext û fişar û hewldanên pişaftina Kurdan û Kurdî li ser axa Kurdistanê berdewam e. Heta niha di parastin û veguhestina zimanê Kurdî de roleke serekî, rola çanda dengbêjî ye. Lê dengbêjî jî di serdemên dawî de bi nivşên nû re kêmbibe jî, hêj jî bi hezkiriyên wê çandê hewla parastinê tê dayîn.

Dengbêjê navdar Îsmâil Seyranoglû ku bi saziya Diwana Dengbêja ya li Wanê hewla gihandina şagirtên nû yên dengbêjiyê dide, hem hewldanên dawî yên ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê fermî û perwerdehiyê hem jî girîngiya çanda dengbêjî nîrxand.

Dengbêj Îsmâil Seyranoglû ji K24 re got: “Nivşên nû li hember dengbêjiyê dûr dimînin û zêdetir berê xwe didin tiştên populer. Gelek jî muzîkên cûrereng derketine û bala wan li ser wan e û naxwazin dengbêjî fêr bibin. Loma li vê derê em hewl didin da ku berê ciwanan bidim vê çanda qadîm û girîng. Li vê derê em hewl didin da ku heskirina dengbêjî bi ciwanan re çê bikin û bi hişyariyekî berê wan bidin vê çandê. Dengbêjiya me dîrok e, dengbêjiya me paraştvanê zimanê me ye, lawîtîya me ye, xemla buk û zavayê me ye, daest û zozanên me ye... yanî her tişteke Kurdewarî di nav



wan sitranan de ye. Em diixwazin vê çandê bi nivşên nû veguhêin û bidomînin û pêkve jî arşiv bikin.”

Ciwanên ku bi heskirina dengbêjiyê ne û her hewla ku di wê şop û çandê de ciyê xwe bigrin didin jî hene. Bêrîtan radghîne ku hezkirina dengbêjî bi wê re, ji malbatê û li ser sîngê bavê wê pê re çê buye û paşê jî li gel Îsmâil Seyranoglû hewla ku wek dengbêjên jin yên beriya xwe bibe dengbêj dest pê kiriye.

Şagirta dengbêjiyê Bêrîtan dibêje: “Ji 10 saliya xwe ve bala min li ser dengbêji ye. Em li gund dimînin û gelek caran elektrîk diçû. Dema ku elektrîk biçûya bavê min sitranên dengbêjî digot. Dema ku ew distêriya min serê xwe dadianî ser sîngê bavê xwe û evîna dengbêjî jî wisa lîmin çêbû. Bavê min her carê nedigot tenê dema ku elektrîk diçû digot û min gelek caran di dile xwe de digot ‘xwezî elektrîk qut bibe’ da ku ez gohdariya bavê xwe bikim. Piştî jî li ser înternetê min gohdariya mamoste Seyranoglû kir û niha jî ew eşqa ji bavê hatiye wiha didome.”

Mahkûm Bêzarî jî ji zarokatiya xwe ve bi dengbêjî gotiye û tîne ziman ku hem dengbêjî hem jî çîrokên sitranên dengbêjî her ji bo wî ciyê meraqê bûne û dixwaze, di pêşerojê de wek dengbêjekî Kurd bê pênase kirin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Aram Fethî bo girtîgeha bajarê Merîwanê hate veguhaştin

Helbestvan û çalakvanê medenî yê xelkê bajarê Merîwanê “Aram Fethî” ku li roja Pêncşemî 27`ê Cozerdanê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin, bo benda qerentîne ya girtîgeha wî bajarî hatiye veguhaştin.

Yek ji kesên nêzî wî çalakvanê medenî tevî piştraştîkirina wê nûçeyê bi Nûçegihaniya “Kurdpa”yê ragihandiye: “Ew çalakvanê medenî heya niha li çavpêkevtin digel malabata xwe bêparkirine û li tohmata ku li dijî wî bi ser de sepandine, ti zanyariyek li ber deşt de nîne.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: “Aram Fethî” nexweşiya romatîzmê heye û hewcehî bi tedavî û çavediriya pizîşkiyê heye.

Sibeha roja Pêncşemî 27`ê Cozerdanê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeheke yasayî êrîşî ser mala wî welatîyê Kurd kiribûn û navbirî binçavkiribûn.

Binçavkirina “Aram Fethî” bi biryara Dadstanê bajarê Merîwanê bûye û hêzên ewlehî piştî vekolîna mala wî hin kereştîyên wî yên kesîn wekî Laptop, Hard û Mobaylê digel xwe birine.

“Aram Fethî”, di wan çend salên derbaz bûyî de, çendîn caran ji aliyê navendên ewlehî ve hatibû gazîkirin û binçavkirin.

Bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetî welatîyekî Kurd canê xwe ji deşt da

Sibedeha roja Yekşemî 30`ê Cozerdanê, kolberekî Kurd ê bi navê “Se`idûn Ehmedî”, xelkê bajarê Baneyê, li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînore “Henge Jal”ê ser bi wî bajarî canê xwe ji deşt da.

Hêzên leşkerî yên hikûmetê, bi bê agehdarkirina berê teqeya raştî li wî kolberî kirine.

“Se`idûn Ehmedî”, bi gumana hilgirtina kelûpelên qaçax raştî teqeya raştî a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatibû.

Kolberekî Kurd canê xwe ji deşt da

Roja Înê 28`ê Cozerdan, “Besîr Ehmedzade”, kolberê xelkê gundê “Dişe”, yê ser bi bajarê Pawê, li ancama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê û bi sedema kûrahiya birînên wî, di nexweşxaneyê Taliqanî ya bajarê Kirmaşanê de canê xwe ji deşt da.

Çavkaniyeke agehdar tevî piştraştîkirina wê nûçeyê bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê ragihandiye: “Heya niha termê wî kolberê Kurd radeştî malbata wî nehatiye kirin û şewrayê dabînkirina parêzgehê bi malbata wî ragihandiye ku piştî bi dawîhatina hîlbijartinên Serkomarî û şewrayên bajar û gundan, nûçeya canjidestdana kurê xwe rabigehînin”.

Roja Duşemî 24`ê Cozerdan, ew kolberê Kurd digel birayê xwe yê bi navê “Beşîr Ehmedzade” li sînore bajarê Newsûdê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê û berkevtina gulle bi serê wî, bi awayekî dijwar birîndar bibû.

“Besîr Ehmedzade” xîzandar û xwediyê zarok e.

Welatîyekî xelkê bajarê Nexedê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Şemî 29`ê Cozerdan, welatîyekî Kurd ê bi navê “Rehman Kerîmî”, xelkê bajarê Nexedê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ew welatîyê Kurd binçav kirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, “Rehman Kerîmî” bo lêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê hatiye veguhastin.

Heta niha lipeyketinên malbata wî welatîyê Kurd bo agehdarbûn ji qedera kurê xwe bê encam mane.

Heta dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatîyê Kurd de hatiye sepandin ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (400)

